## Lîsteya kontrolê

Ji kerema xwe van belgeyan tev xwe bîne:

- ☐ Belgeyên kesane
- ☐ Gewahiya navnivîsandinê
- ☐ Bawernameyên dibistanê
- ☐ Bawernameyên têkildarî miqatebûna ji kesan

Ji kerema xwe demeke hevdîtinê hevaheng bike.

Ji kerema xwe eger pêkan e kesekî pêbawer tev xwe bîne ku bi zimanê almanî biaxive.




**Saetên şêwirînê:**
**Şêwirîn tenê piştî dorgirtinê pêk tê**

## Hevkarê te li cih

**Beşa Weselê – Qayîm Meqamtî**
Xizmetên taybet ên 49 Entegrasiyona Navçeyî
Reeser Landstraße 31, 46483 Wesel

KREIS WESEL

Telefon 0281 207 - 4242
Faks 0281 207 - 674240
E-Mail students-welcome@kreis-wesel.de






Kodeya GPSyê: 51° 39′ 53.9″ N 6° 36′ 30.2″ E

Wesayîtên veguhestinê yên gelemperî:
Trenên hêlên RE 5, RE 19, RE 19a û RE 49 heta rawestgeha Hesinrê
Hêlên Utubûsê 63, 64 û 84 ji rawestgeha Hesinrêya Weselê heta rawestgeha "Kreishaus".

Gefördert durch:
Ministerium für Schule und Bildung des Landes Nordrhein-Westfalen
Ministerium für Kinder, Jugend, Familie, Gleichstellung, Flucht und Integration des Landes Nordrhein-Westfalen

Elametên wêneyî: © Stadt Köln

Kommunales Integrationszentrum
Kreis Wesel



# Dibistan li navçeya Weselê

Şêwirîna dibistanê ji bo
Zarok û nûciwanên ku
Nû koçber bûne

Kurmāngī
Kurdisch (Kurmanji)

Dayîk û bavên hêja, kesên xwedan mafê sergêriyê û sergêrên qanûnî yên hêja,
Zarok û nûciwanên hêja,

Li Nordrhein Westfalenê hemî zarok û nûciwan di temenê 6 heta 18 saletiyê da diçin dibistanê. Ev maf û erka wan e.

Navenda Entegrasiyona navçeyî ya navçeya Weselê ji bo zarok û nûciwanên nû-koçberbûyî û dayîk û bavên wan û her wiha kesên din ên xwedan mafê sergêriyê û sergêrên qanûnî, civînên ragihandin û şêwirîna kesane derbarê çûyîna bo dibistanê raber dike.


Mamosteyên bi ezmûn derbarê mijarên xwarê bi awayê kesane û li gorî hewcetiyê şêwirînê didin:

- Pergala dibistan û perwerdehiyê li Nordrhein Westfalenê
- Dibistan û navendên fêrkariyê li navçeya Weselê
- Biyografiya fêrkarî û plandarêştina rêya fêrkariyê
- Pêşniyazkirina cûreya dibistana guncan
- Lênêrîna têketina bo dibistanê
- Pêvajoya navnivîsandinê li dibistanê
- Xurtkirina pirrzimanî an fêrkariyê Zimanê jêderk
- Piştrastkirina bawernameyên perwerdehiyê
- Danasîn bo navendên din ên şêwirînê
- Dergehên online ji bo hînbûna zimanê almanî
- Pakêta fêrkarî û beşdariyê (ji wan xurtkirina zimanê almanî yê bilind)
- Entegrasiyona civakî bi rêya bernameyên çandî û werzîşê
- Guhertina dibistanê di çarçova sê salên destpêkê yên perwerdehiyê li dibistanên Almanyayê
- Derbasbûn bo perwerdehiya asayî
- Pirsgirêk û mijarên di pêvajoya rojane ya dibistanê da

## Pêvajoya civîna Şêwirînê

Ji kerema xwe bikeve têkiliyê û demeke şêwirînê hevaheng bike:

0281 / 207 4242




Ji kerema xwe hevrê di gel zarokên xwe were civîneke şêwirînê û hemû belgeyên pêwîst tev xwe bîne (bala xwe bide ser lîsteya kontrolê):








Ji kerema xwe eger pêkan e, kesekî tev xwe bîne ku bi zimanê almanî biaxive û baweriya te bi wî/wê hebe:





© wmiami - Fotolia.com

## Pêvajo heta dema navnivîsandina li dibistanê

Zarokên te di Rêveberiya Tenduristiyê da ji bo lênêrîna têketina bo dibistanê tên tomarkirin:




Rêveberiya Tenduristiyê di gel te dikeve têkiliyê û demeke hevdîtinê ji bo te terxan dike:



Navenda Entegrasiyona li civakê ya navçeyê zarokên te bo dibistanekê dide nasandin:




Navenda Entegrasiyona li civakê te û dibistanê haydar dike ku li kîjan dibistanê tu dikarî zarokên xwe tomar bikî.






Bi hêviya kêf û serkeftina zehf li dibistanê!

